Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 60
31'ê Adarê
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne


## Îran Ji Elqaîdê Xeternaktir E

Mark Kîmît, cîgirê Wezîrê Berevaniya Amerîka bo kar û barên Rojhilata Navîn: Piştî bûyera 11'ê Septamberê Elqaîde mezintirîn gef li deverê de bû, lê niha Îran bi gefa herî mezin tê hesibandin.

Herwiha got em li Îranê nîgeran in. Îran li cehda bidestxistina çekên navikî ye, hevkariya rêxistinên terorîstî dike û tundrewên Îraqê re çekan dişîne. Herwiha zêde kir ku Sernekitina me li Îraqîê de tê wateya bihêzbûna Îranê.

**Dr. Qasimlo:**

# Baştirîn Xelat Bo Şehîdan, Domandina Rêya Wan E



Kevala Hunermendê Nigarkêş Kemal Ethemî

Roja Înê, 30.03.2007'an, di yek ji binkeyên Deftera Siyasî ya PDK Îranê de rê û resmek berfireh bi boneya Roja Şehîdên Kurdistanê... **Dom: R. 5**

## Malikî Biryarên Komîsyona 140'ê Qebûl Kirin



Civata wezîran ya Iraqê di civîna xwe ya roja Pêncşemî de biryarên Komisyona Bilind a Madeya 140-ê gotûbêj kir û her 4 biryarên lijneya madeya 140 hatin qebûl kirin. Navaroka wan 4 biryaran weha ne:

1-Şandina erebên hinartî bo cihên xwe yên kevin

2-Vegerandina kesên ku di dema Rejîma Beesê de ji Kerkûkê hatibûn derxistin.

3-Kesên ku tên şandin û tên vegerandin, dê werin qerebû kirin û karmendên berê jî ku ji aliyên rejima Beesê ve hatibûn derxistin, ji nûve dest bi karê xwe bikin.

4-Girêbestên kişt û kal ku dema rejîma Beesê vê hatibûn kirin, bên hilweşandin.

Di civîna civata wezîran de li ser van biryaran tenê ew tişt hate zêde kirin ku şandina wan malbatên erebên hinartî li ser daxwaz û rizamendiya wan be.

Çawkanî: "netkurd"

## Daxwaza Navneteweyî Ji Îranê Bona Serbestberdana Deryavanên Birîtaniyayî



Roja înê, 30.03.2007'an, Yekîtiya Ewropayê daxwz ji Îranê kir ku li zûtirîn dem de deryavanên Berîtanyayî ku mideheke berî niha ji aliyê rejîma Îranê ve hatine girtin, azad bike. Ger rejîma Îranê vê yekê bicî nehîne dê tevî kiryarên hewce berbirû be.

Wezîrên kar û barên Derve ên Yekîtiya Ewropayê di civîna xwe de li bajarê Birmen a li Almaniyayê de, li daxuyaniyekê de daxwaz ji Îranê kirin hindî zû dewleta Berîtaniyayê ji rewşa melevanên wî welatî agehdar bike.

Di vê daxuyaniyê de hatiye ku gişt belge û senedên berdest eyankerê vê çendê ne ku hêzên deryayî yên Berîtyaniyayê li dema binçavkirinê de, li halê hat û çûn di nava ava Îraqê de û li gor daxuyaniya 1727'ê a Civata Ewlekarî a Rêxistina Navneteweyî bûne ... û li gor vê çendê ev binçav kirine dijî yasayên Navneteweyî ye.

Her wiha Konseya Ewlekariyê li daxuyaniyekê de jî daxwaza ji Îranê kir ku dawî bi binçavkirina deryavanên Berîtaniyayî bîne û wan azad bike.

Peyama Newrozî Ya Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê, Birêz Mistefa Hicrî 2

Peyama Birêz Mistefa Hicrî, Di Roja Şehîdên Kurdistanê De 4

Kîmiyabarana Helebçê, Qonaxek Ji Pirosesa Netewesaziyê Di Îraqê De 6

Pesendkirina Biryarnameya 1747'an Li Dijî Îranê, Derheq Doza Etomî 7

Berfirehbûna Nerazîbûna Mamostayan Ji Çi Çavkanî Digire? 8

GAZINC Û GILÎDARÎ 9













Hevpeyvînek Bi Birêz Mecîd Heqî Pispor Di Warê Ragihandinê "taybet bi Agirî" R. 10, 11


**"Li Serdema Înternet Û Gilobalîzasyonê (Cîhanîbûnê) Çanda Çend Medyayî Û Weşana Elektronîk Hêdî Hêdî Cihê Weşana Çap Digire Û Medyaya Dîcîtal Dibe Weşana Herî Bingehîn Ya Kurdî"**



www.arsivakurdi.org

Mistefa Hicrî:

# Newroz Ji Her Du Aliyên Xweza Û Dîrokê Ve, Hilgirê Maneya Guhertin Û Nûbûnê Ye



**Peyama Newrozî Ya Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê, Birêz Mistefa Hicrî**

**Xelkê mafxwaz yên Kurdistanê!**

Newroza 1386'an, ji we keç û xortên neteweya Kurd pîroz be, li her cihekê ku hûn lê dijîn, bi taybet gelê Kurd li Kurdistana bin desthilata Komara Îslamî ya Îranê de. Her wiha pîroz be ji malbatên Şehîdên rêya rizgariyê û girtiyên siyasî ên ku van rojane di girtîxaneyên rejîma Komara Îslamî de diborînin.

**Gelî birêzan!**

Newroz di xwezayê de tê wateya serkevtina roj, ronahî û germahiyê bi ser tarîtî, cemidîn û sir û seqemê de. Destpêka serhildan, bişkivîna gul û giyan û bi giştî nûbûnê ye. Newroz di dîrokê de serkevtina serhildana **Kaweyê** xizan û lawkuştî, êxsîrê destê zordariyê, bi ser **Zehak**, Paşayê dîktator, dilreq û bêrehm e. Bi vî awayî em mêze dikin ku Newroz ji her du aliyên xweza û dîrokê ve, hilgirê maneya guhertin û nûbûnê ye. Guhertin û nûbûn jî, hêvênê hemû wan pêşketinan e ku dinyaya îro di warên rakirina eqliyetên rizî û hişk û req ên wekî Komara Îslamî ya Îranê ye ku hêşta germahiya serdem negihiştiye mêjiyê cemidî ê Sedsala Navîn yê wan.

Bê heger nine xelkê têhniyê azadî û nûbûnê li seranserê Îranê û yek ji wan gelê Kurd, herdem ew cejna neteweyî pîroz kirine û bi vê hincetê kêf û şahî lidar xistine. Komara Îslamî jî her ji destpêka hatin bo ser kursiya desthilatê ve di sala 1979'an, Newroza bixwîn ji bo neteweya Kurd li bajarên Sine, Nexede û gelek gundan pêk anî. Dijberiya eşkere ya xwe tevî cejna Newrozê da xuyakirinê û heta niha jî li ser rêya rêvebirina rê û resma Newrozê de kosp û astengan çê dike.

**Hevwelatiyên hêja!**

Eva ku cihê kul û keserê ye, eva ye di vê rojê de ku roja şabûn û dilxweşiyê ye, neteweyên bindest ên Îranê di demekê de vê Newrozê jî cejn digirin û pîroz dikin ku siya rejîma Komara Îslamî hêj li ser mil û baskên wan giranî û qursatiyê dike. Bi hezaran kes ji keç û xortên xebatkar ên wekî Kawe li cihê wê çendê ku di vê rojê de li hembêza germ ya malbatên xwe de beşdarî cejn û şahiyan bibin, di girtîxaneyên Zehakê zeman de niştecih in. Sedan hezar kes ji mezinên malan di xem û nerihetî û eleman de ne, ji ber ku nikarin hewcehiyên herî kêm yên malbatên xwe ji bo vê cejnê bidest bixin.

Me di rewşekê de sala 1385'an derbas kir û gav avête nava sala 1386'an ku em şahîdê xurtbûna zêdetir ya xisar û pirsgirêkên civakî bûn!

Qasê betalî û bêkariya jinan aliyê kêm %20.18 yanî du car zêdetir ji qasê bêkariya mêran e. 2 ji sedê ya nifûsa Îranê di rojê de bi kêmtirî Dolarekê dijî. Hêşta beşeke xuya ji nifûsa Îranê şiyan û karîna bidestxistina hewdariyên herî kêm yên sereke ên jiyanê tune ye. Nirxandina herî cihê dilxweşiyê, wê şêniyê bi 10 heta 15 milyon kesî dihesibînin ku di bin hêla xizaniyê de dijîn. Radeya kesên ku madeyên bêhişker bikar tînin, 3 milyon û 700 hezar kes e. 6 milyon bêkar di welat de heye û salê 150 heya 180 hezar kes ji nifûsa xwendewar û pispor ya Îranê welat bi cî dihêlin.

Ewên ku me qala wan kir tenê hinek ji arîşe û pirsgirêkên civaka Îranê ne û ji serhejmariyên fermî yên hikûmetê hatine wergirtinê, di halekê de ku asta rastîn û dirust ya wan pirsgirêkan gelek ji vê çendê zêdetir e.

Serbarê wan hemû derdane û dehan derdên din ên bê çareserî, tundî û dijwarî û serkutkirin, nemaze di nava neteweyên mafxwaz û yek ji wan neteweya Kurd de yê gihîştiye radeya xwe ya herî zaf û bilind. Kuştin û qirkirina xelkê di meş û xwenîşandanan de, zîndanî û îşkencekirina wan di sala 1385'an de, ji berê tund û tûjtir birêve çû. Lê ewa ku di vê derheqê de cihê hêvî û dilxweşiyê ye, berxwedana bêrawestiyan ya xelkê li hember hêzên serkutker ên rejîmê bo beravanî û parastina maf û azadiyên wan e. Di vê derbarê de xebat û tekoşîna neteweyî ya neteweyên Îranê di sala borî de cihê rêzgirtin û pêzanînê ye.

Xwenîşandan, girevgirtin û awayên din ên xuyakirina nerazîbûna xelkê Kurd ji rejîmê, li seranserê salê û li hemû bajar û bajarokên Kurdistanê dom kiriye. Di pêvajoya wan bûyerane de bi sedan kes ji xebatkartên Kurd, rojnamevan, xwendekar, kedkar, jin, çîn û taxên din ên civaka Kurdewarî hatine cezakirinê, lê demekê xebat û berxwedan ne sekiniye.

Ji bilî vê çendê fedakarî û cangorîtiya tex û qatên cur bi cur ên civakê û kesayetiyên olî heta Şîî jî di sala 1385'an de, gelek ji salên borî berçavtir bû. Di nava wan çînane de pêwîst dike, em qala rola girîng û bibandor ya jin û mamostayan bikin ku serbarê girtin û zîndanîkirina wan, xwenîşandan û xuyakirina nerazîbûna xwe derheq binpêkirina mafên xwe domandin, bi awayekê ku nerazîbûna wan di hemû cîhanê de deng veda.

PDK Îranê piştgiriya xwe ji mafê berheq yê tev civatên neteweyên Îranê îlan dike û bi çavê rêz û hurmetê mêzeyî berxwedaniya wan li hemer hêzên serkutker ên Komara Îslamî dike.

**Xûşk û birayên delal!**

Tevî berfirehtirbûna nerazîbûna xelkê ji rejîmê di sala 1385'an de, pêvajoya bêzarî û nerazîbûnê ji wê rejîmê di asta navneteweyî de jî xurt bû. Em di sala derbasbûyî de şahîdê dubare mehkûmkirina Komara Îslamî ya Îranê derheq binpêkirina mafê mirovan ji aliyê kom û komeleyên mafên mirovan ên cîhanê bûn.

Maytêkirina wê rejîmê di kar û barên hundirîn ên welatên cîran gelek eşkeretir ji berê ji bo gişt dinyayê derket. Alîkariyên rejîmê bi Hizbulaha Lubnanê re di şerê navbera Îsraîl û Hizbulahê de bi armanca guhertina hikûmeta hilbijartî ya xelkê û damezrandina hikûmeteke bi dilxwaza Komara Îslamî ya Îranê li Lubnanê, xurtirkirina hêzên li dijî aştiyê, li Filistînê û nemaze hevkarîkirina hemû cure bi girûpên terorîstî ên li dijî demokrasiyê di Îraqê de û dirûşm û bernameyên rejîmê bo ji holêrakirina Îsraîlê li ser topa erdê, ji maytêkirinên herî girîng ên rejîmê di sala 1385'an de bûn.

Yek ji armancên siyaseta terorîzma dewletî ya Komara Îslamî a Îranê, tawanbarkirina çend kes ji berpirsiyarên payebilind ên rejîma Komara Îslamî – ku **Haşimî Refsencanî, Elî Felahiyan û Elî Ekber Welayetî** di nava wan de ne – bû, bi sûça beşdarîkirina wan di teqandina Navenda Çandî ya Cihûyan li "Buenos Aires" a Paytexta Arjantînê di sala 1994'an de ku bû sedema kuştina 85 kesan. Dadgerê Dadgehê di roja 18'ê Çiriya Paşîn ya îsal de hukm û biryara navneteweyî ya girtinê ji bo wan da û niha "INTERPOL" (Polîsê Navneteweyî) mijûlê vekolînê li ser çawaniya girtina wan kesa ye.

Rejîmek bi bîr û ramanên wiha, dema ku proje û xebata Etomî ya xwe bi armanca çêkirina bombeya Etomî berfirehtir dike, pir xwezayî ye ku dê cîhan li hember de rabiweste. Biryara 1737'an ya Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî bi merema cezakirina rejîmê bi sedema zorîkirin û guhnedan bi şîretên Konseya Ewlekariyê û Ajansa Vejena Etomê ya Navneteweyî di derbarê destberdan ji projeya navikî, bêzarî û nefreta herî zaf ya welatên cîhanê derheq Komara Îsamî a Îranê di sala 1385'an de, bû.

Bi vî awayî em dibînin, çi di warê navneteweyî û çi di warê hundirîn de, rejîm

www.arsivakurd.org

di rewşa herî nebaş ji destpêka bidestvegirtina desthilatê heta niha de ye.

Hêvî bi reform û guhertinan di radeyeke pir jar û lawaz de ye û niha ji piraniya zaf ya xelkê Îranê û derve re jî ron û eşkere bûye ku ev rejîme nikare reform û guhertinan pêk bîne û tenê çareserî hiloşandina wê rejîmê û avakirina rejîmeke demokratîk ya federal e.

Lê tevî hemû delîve û rewşên jêhatî ji bo hiloşandina rejîmê, pirsgirêkeke sereke û mezin ku ji despêkê ve hebûye û niha jî di cihê xwe de ye, nebûna saziyên demokratîk weke sendîka û rêxistinên ne dewletî ne ku bikarin xelkê nerazî organîze bikin û rêk bixin. Sedema bingehîn ya vê pirsê jî dîsan vedigere ser stûyê rejîmê, ji ber ku rêyê nade ku tu rêxistineke siyasî û senfî dûr ji kontrol û zêrevaniya hikûmetê pêk bihê.

Demekê jî ku hevgirtin di nava xelkê de tune be, serkut û qirkirin hêsantir e. Her wekî me di sala borî de dît, çaxê ku nerazîbûna kedkaran tepeser dike, tu yek ji senfên din bi kiryar piştevaniyê jê nakin, her bi vî awayî dema ku meşa nerazîbûnê ya jinan û mamostayan tê serkutkirinê. Em bi wê hêviyê pêyê xwe davêjine sala 1386'an ku di wê salê de ji bo vê arîşê û pirsgirêka girîng ya tevgera demokrasîxwazane ya xelkê her ji hêla wan bi xwe çareseriyek jê re bihê peydakirinê.

Derheq hevgirtina opozîsyonê li derveyî welat jî, mixabin ew kêmasî tê dîtinê û heya niha hevgirtin tenê pêkhatina Kongireya Neteweyên Îrana Federal e ku di destpêkê de ji 7 rêxistin û civatan pêk dihat û di civîna dawî de ku nêzîk mehekê berî niha li Londonê hate lidarxistin, hejmara endamên wê gihîşte 13 rêxistinan. Ew rêxistin komek sazî ne ku nûneriya parek ji neteweyên Kurd, Azerî, Belûç û Turkemenan dikin.

Armanca wan pêkanîna Îraneke demokratîk û federal li ser bingeha coxrafî û neteweyî ye. Ez hêvî dikim ku kongre bikare di sala nû de xebata xwe zêdetir xurt bike û rêxistinên siyasî yên pitir li dora xwe kom bike.

Serbarê lawaziyên tevgerê, hêvî bi serkevtinê ji hemû demê bihêztir û xurtir e. Zext û givaşa hundirîn û navneteweyî rejîm rastî gelek pirsgirêkan kiriye û roj bi roj qursî û giraniya wan zextan bêtir û zêdetir dibe. Ev rewşa xirab û nebaş ku ji bo rejîmê pêk hatiye, hinde din xelk hêvîdar kiriye û wan ji bo xebat û berxwedanê hay dide. Aqibeta rejîmeke wilo ji bilî nemanê tu tişteke din nine. Lê erk û wezîfeya gişt xelkê Îranê û rêxistinên siyasî di vê rêyê de girantir tê berçav. Em hêvîdar in tev aliyek bi seh bi berpirsiyariya zêdetir mêzeyî sala nû û wezîfeyên ser milê wan di vê pêxemê de bikin.

PDK Îranê di vê derheqê de li sala 1386'an hewlê dide:

- Di asta seranserî diyalog û danûstandina zêdetir tevî wan hêzên demokrat ku bawerî bi mafê neteweyî hene û hikûmeta pêşeroja Îranê di şeklê federalî ya li ser bingeha coxrafî û neteweyî de dibînin, pêk bîne û hindî pê çêbe, wan hêzane ji bo pêkanîna curek alîkarî û hevpêwendiya jêhatî di çarçoveya hevbeş de ji hev nêzîk bike.
- Ji bo nasandina zêdetir ya gelê Kurd li Kurdistana Îranê bi kom û komeleyên navneteweyî re û çawaniya binpêkirina mafên wan ên demokratî ji aliyê Komara Îslamî ya Îranê di meydaneke berfirehtir a dîplomasî li Rojava û herêmê de bixebite. Di vê derbarê de ji terîbûna "UNPO"ê ku di sala 1385'an de, Partiya Demokrat bû endamê wê rêxistina navneteweyî û ji endambûna xwe ya berê di Enternasyonala Sosyalîst de bi başî mifahê jê distîne.
- Di asta hundirîn de her çend ku heta niha Partiya Demokrat bi dûr ji çêkirina tem û mija piropagendeyî, bi kiryar ji bo pêkanîna enî, yan yekîtiyeke bi kiryar di navbera wan rêxistinên serbixwe û naskirî ên refên opozîsyonê ku meydana tekoşîna wan Kurdistana Îranê ye, gelek hewil daye, mixabin di vê derbarê de destkevtek ku em li benda wê bûn, bidest nehat, lê di vî warî de jî em bêhêvî ninin û bi hewce dizanin ku di pêxema hevgirtina hêzên Kurdî de cehd û hewla bêtir bidin. Em hêvîdar in ku ew hesta bi berpirsiyariyê di navbera hêzên din jî, alîkar be ji bo gihîştin bi wê armancê di sala nû de.
- PDK Îranê tevî rêxistinên siyasî ên demokrat û pêşketinxwaz yên hemû parçeyên Kurdistanê têkiliyeke nêzîk û dostane heye û qahîm û bihêztirkirina wan pêwendiyane di sala 1386'an de, yek ji erkên din ên partiyê dibe.

Hemû ew piroje û bernameyên ku qala wan hate kirinê û Partiya Demokrat ji bo pêkanîna wan di asta şiyan û îmkana xwe de xwe bi berpirsiyar dizane, di pêxema xelkê Kurd di Kurdistana Îranê de ye û ji bo rizgarkirina vê parçeyê Kurdistanê di bin stem, zordarî û tepeserkariya rejîma Komara Îslamî ya Îranê de ye. Lewra xwezayî ye ku PDK Îranê ji bo organîzekirina zêdetir a gelê Kurd li Kurdistana Îranê di vê salê de bernameya nû hebe. Di sala derbasbûyî de alîkarî û piştgiriya gelê Kurd li Kurdistana Îranê û Kurdên vê parçeyê Kurdistanê li xerîbî û derveyî welat pitir berçav bû, girîngiya wê piştevaniyê bersivdan bi daxwaza PDK Îranê ji bo ne beşdarîkirin û baykotkirina hilbijartinên Şêwrên Îslamî ên Gund û Bajaran û her wiha xuyakirina nerazîbûnê û bêzariyê di 22'ê Pûşperê, salvegera terorkirina rêberê mezin û navdar yê gelê Kurd, Dr. Qasimlo bû.

Em çavnihêrê vê çendê ne ku di sala 1386'an de, ciwan, jin û tex û qatên din ên civakê bêtir ji berê jî li dora partiya xwe, Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê kom bibin heya bi piştgiriya me tev aliyekê, sala 1386'an bikin bi saleke tejî destkevt ji bo tevgera gelê me di wê beşa Kurdistanê de.

Bi hêviya saleke tejî ji destkevt ji bo tevgera gelê Kurd û gelên din yên Îranê û saxî û silametî ji bo yek yekê we ezîz û xweşteviyan.

**Hemû rojên we cejn û cejna we jî pîroz**

# Daxwaza Amerîka ji sûriyê bona rêzgirtin ji mafê mirov û azadkirina girtiyan

Car din Hikûmeta Amerîka daxwaz ji Hikûmeta Sûriyayê kir ku rêz ji azadiya siyasî û mafê mirov li welatê xwe de bigre. Herweha wan girtiyan serbest berde ku li ser derbirîna raya xwe hatine hepsî kirin.

Şan mek Kormek, berdevkê Wezareta Derve ya Amerîkayê carek din nîgeraniya xwe li ser kiryarên Hikûmeta Sûriyê bi nîsbet girtina û hêştina kesatiyên siyasî yên Sûriyayê li girtîxaneyên wê de bi egera derbirîna bîr û rayên xwe da eyanê û daxwaz jê kir ku wan bi zûyî serbest berde.

Herweha ragihand ku helwesta Sûriyê li ser girtina cudabîran cihê dax û keserê ye û ev liv û riftarên



Hikûmeta Sûriyê jî bi ne yasayî û dûr ji hemû pîvanên navneteweyî yên taybet bi mafên mirovan hesiband.

# Li Ser Daxwaza Welatên Azerbaycan, Zîmbawe Û Bengiladîşê Zêrevaniya Berdewam Û Bi Rêk Û Pêk Ya Civata Mafê Mirovan Li Îranê Bi Dawî Hat!

Civata Mafê Mirovan a ser bi Rêxistina Neteweyên Yekbûyî roja duşemî li derheq bi dawîanîna bi zêrevaniya berdewam û berfireh li ser kiryarên welatên Îran û Ozbekistanê li warê Mafê Mirovan dengê erênî da. Civata Mafê Mirovan ku ji 47 welatan pêk hatiye, li ser pîşniyara girûpeka karî, pêkhatî ji welatên Zîmbawe, Azerbaycan û Bengiladiş, Arjantîn û Feransayê bo derxistina navê van du welatan ji lîsteya welatên ku ji nêzîk ve ketine ber zêrevaniyê, dengê erênî da. Ev biryara tevî lome û gazindên zaf welat û û rêxistinan. Welatê Amerîka ku vê rêxistinê bi fermî nade nasandin, çimku Amerîka li ser vê baweriyê ye ku dibe welatek bibe endamê vê saziyê ku rêz û hurmetê ji mafê mirovan bigre û bi tundî rexne li vê biryarê girt. Herwiha çalakên mafê mirovan nerazîbûna xwe tevî vê biryarê eşkere kirin û daxwaz kirin ku pêragihîştin bi dozên wan li derheq Îran û Ozbekistanê were kirinê.

www.arsivakurd.org

# Peyama Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Di Roja Şehîdên Kurdistanê De

**Hevwelatiyên birêz!**
**Beşdarên rê û resma bîranîna 60'emîn salvegera şehîd bûna Pêşewayê Kurd, Qazî Mihemed!**

Li 10'ê Xakelêweya îsa de, 60 sal bi ser şehîd kirina Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî re derbas dibe. Pêşewa Qazî Mihemed bi avakirina PDK Îranê û bi sedema vê partiyê jî, avakirina yekemîn Komara Demokrat a Kurdistanê, şanaziyekî mezin li dîroka xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd de bo xwe û Partiya xwe tomar kir.

Wî li midehê yazdeh mehên avabûna Komara Kurdistanê de nîşan da ku rêberekî demokrat û bê mînak yê serdemê xwe ye. Wekî Dr. Qasimloyê nemir li pirtûka "Çil Sal Xebat li pêxema azadiyê de" nivîsandiye ku **Pêşewa gulek bû ku li nava deşt û çolekê de şîn bibû**.

Berpirsiyarên rejîma Paşatiyê û dujminên maf û azadiya gelên Îranê piştî hiloşîna Komara Kurdistanê li roja 30'ê Sermaweza sala 1325'ê Rojî de, heya roja lidarvekirina wî li 10'ê Xakelêweya 1326'ê Rojî de (30.03.1947), bi dana gelek qewl û sozan cehd kirin heta ku Qazî Mihemed razî bikin daku bibêje ji kiryarên xwe peşîman e. Lê Pêşewayê nemir tevî wê ku dizanî bersiva red û nerênî bi rejîma Paşatî, bi fermayişî hesiband. Berevaniyên Pêşewa Qazî Mihemed pêtir li wî warî de cihê baldan û heyrîmanê ne ku li vê dadgehî kirinê de li cihê berevanî kirin ji xwe, berevanî ji xwast û daxwazên gelê Kurd dikir û bi heq wî ev erk û rol zor bi başî dirêve bir. Li encam de bi van berevaniyên netirsane yên xwe ders û şîretek binirx û ceribînek baş bo xebatkarên rêya rizgariyê piştî xwe bi cih hişt. Wî dersa wefadarî û emgedariyê bi armanc û kornoj nebirin bo dujmin hînî rêvîngên rêya xwe kir ku bi xweşî ve qotabiyên wî baş hîn bûne û li jiyana şoreşgeriya xwe de bi başî bikar anîne.

Serencam li roja **10'ê Xakelêweya 1326'ê Rojî (30.03.1947)'an de, Pêşewa Qazî Mihemed, Seyf û Sedr Qazî li meydana Çarçiraya Mehabadê de hatin darvekirinê**. Her li vê pêwendiyê de berê jî komek din jiwan wekî "Feyzolabegî" hatin îdam kirin. Rast e dilê wan li wê rojê de li Kotanê ket, lê heta hetaye dê li nava dilê bi kul yê neteweya xwe de bimînin û armanca wan, rêbaza bi Milyonan Kurd e.

Piştî şehîdbûna Pêşewa, rêvîngên rêya wî û xortên bicerg û netirs yên vî gelî rêya wan domandin û xebata bo azadiya gel li bin rênimayî û rêveberiya Partiya jêhatî û demokrat a Pêşewa de herweha dom kir.



Ger Pêşewa hat şehîd kirinê, Dr. Qasimlo hate meyandin û tekoşîn û xebata nepenî a xwe li nava dilê rejîma bikojê Qaziyan de domand û xew ji çawê şewperest û dijî geliyan herimand. Komek ji nirxa canê wî xilas dibe, lê dîsan jî bersiva red da û li hemberî xwestekên wan de stû xwar nebû.

Pêşewa li midehê dadgehîkirina di bêdadgeha leşkerî de zor biwêr û netirsane li hemberî bêdadgeha rejîma Paşatiyê de rawestiya û berevanî ji armancên gelê Kurd kir. Li rastî de Pêşewa bû ku bêdadgeha leşkerî a Paşatiyê kire hola dadgehî kirina rejîma dijî gelî û serberedayî a Paşatiyê. Li pêvajoya dadgehê de, li hemberî bêhurmetî û sivikatiyên dadverên dadgeha leşkerî bi gelê Kurd re, Pêşewa çend caran êrîş kire ser wan û dadgeha wan bi dadgeheke

xebatkarên Partiyê tevgera 46 – 47'ê bi qasê 18 mehan birê xistin. Tevgera 46 – 47'ê zengekî bitirs û xeter bo rejîma paşatiyê û hişyarkarê xebatkarên rêya azadiyê bû.

Zenga xeterê bo rejîmê, bona wê bû ku bi rejîma şa bide selimandinê ku dîktatorî û zext û givaş heta heta nabe, dengê hişyarkar bo xebatkaran jî bona wê bû ku bide selimandinê rejîma paşatiyê ew rejîma giran û qahîm nine ku nehê hejandin. Li bizava 46 – 47'an de jî herçiqas ku hejmarek ji baştirîn xortên gelê Kurd şehîd bûn, lê wan bi xwîna sor a xwe dara



azadiyê têr av kirin, daku rojekê ber û berhemê bigire û gel li bin sîbera wê de vehesiyên.

Piştî tepeser kirina tevgera 46 – 47'ê jî xebat ji bo gihîştin bi azadî û mafê gel her berdewam bû, taku serencam gelên Îranê li 22'ê Rêbendana 1357'ê Rojî de tomar û bar û binegên reş û tejî ji cinayetên rejîma Paşatiyê ji holê rakirin.

Piştî hiloşîna rejîma şa, rejîma Komara Îslamî cihê wê girt. Rejîmek ku ol û meseb xiste xizmeta siyasetên dijî mafên neteweyî û demokrasiya rejîma berê û bi wî awayî jî rewatî û meşrûiyetekî ayînî bi xwînrêjiyên xwe bexşî. Lewere em dibînin ku karwanê şehîdên me li vê heyamê de dirêjtir bûye û heya niha jî herweha didome. Li pêşiya vê Karwanê de jî Dr. Qasimlo û Dr. Seîd û gelek rêber û serokên jêhatî yên dinê yên qada xebata dijî bê serûberî û serberedayiya li Kurdistana Îranê de diyar in ku bi fermana desthilatdarên Hikûmeta Îslamî xwîna wan hatibû helal kirin.

Hemû ew şehîdane rêvîngên rêya Pêşewa ne, rêya serbilindî û şerefê, rêvîngên ku li bin siya fidakariya wan de, neteweya me li bi pîlan û givaşên dujminan de neheliya û bi şanazî ve bi domandina xebata netewayetiya xwe bûye bi çiql û qelema çawê dujmin û neyaran.

Piştî borîna 60 salan bi ser bûyera şehîdkirina Pêşewa Qazî Mihemed û piştre jî şehîdên tevgera 46 – 47'ê û dehan hezar şehîdên qonaxa dawîn ya Şoreşa gelê me pêkhatî ji rêber, kadr û pêşmerge û xelkê sivîl, pêvajoya xebata gelê Kurd her berdewam e û xebata neteweyî ya gelê me li pêxema maf û azadiyên wê de roj bi roj serkevtinên pêtir tomar dike. Li hemû parçên din yên nîştimanê Kurdan (Kurdistanê) de xebat roj li pey rojê pêtir geş û xurt dibe. Heta ku diçe Kurd baştir li bîr û raya giştî ya cîhanî û kom û komeleyên navneteweyî de wekî neteweyek mafxwaz û demokrat tê nasînê û dost û hevalên zêdetir peyda dike.

Hemû ew fidakarî û tekoşîna xortên welatparêz û biwêr yên Kurd e ku ev gotina binirx ya Pêşewa tîne bîra me ku li dema dadgehîkirina li bêdadgeha şa de got: **Hûn**

www.arsivakurdi.org

**bi kuştina min Qazî Mihemedekê dikujin, lê piştî min her keç û xortekî vê Kurdistanê Qazî Mihemedek in û dê xebatê heya gihîştin bi azadiyê bidomînin".**

**Xûşk û birayên birêz!**

Berxwedaniya xortên gel, bûye sedema wê ku ne tenê hêviya dîktatoran ku helandina neteweya Kurd li nav neteweyên Fars, Turk û Ereb de bû, bi ci nehêt, belkî ji aliyekê ve encama xwîna şehîdan, nerawestiyan û bi çoknehatina berxwedaniya gel, ji aliyê din ve jî guhertinên li cîhan û deverê de, bûne sedem ku li vî serdemî de dîktator ber bi lawazî û nemanê ve biçin û neteweyên bindest û zulmlêkirî yên deverê û yek ji wan jî neteweya Kurd ber bi geşandin û serkevtinê gavan bavêje.

Dîktatoriya Bexdayê hiloşiya, Kurdên vê parçeyê bi parek ji xwest û daxwazên xwe gihîştin. Li Turkiyê serbarê hemû zulm û komployên desthilatdarên Kemalîzmê li dijî gelê Kurd, berxwedaniya vê gelî xurttir dibe û dibîte mijarek navneteweyî. Hikûmeta Paremayî ya Komara Îslamî a Îranê ne tenê her nekarîn bi teror kirina bi sedan rêber û xebatkarên Kurd hewara mafxwaziya Kurdan li vê beşê de bêdeng û bifetisînin, belkî îro keç û xortên vî parçeyî ji welat, netirsane û biwêranetir ji caran dijatiya kirêgirtiyên rejîmê dikin.

Rejîma Komara Îslamî pêtir ji salên borî li dest kirîzên hundirîn û derveyî yên ku bi xwe afirandine, dinalîne. Biryara sêhemîn a cezadana Îranê ji aliyê Konseya Ewlekar ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî li ser domandina bernameyên navikî ji aliyê rejîma Îranê ve, û tekez û pêdagiriya rejîmê li ser guhnedana bi xwasta civaka navneteweyî, çarenivîsa xelkê Îranê bi pêşerojeke tarî û nediyar re berbirû kiriye.

Li Sûriyayê de jî gelê Kurd hin deskevtên siyasî bidest xistine û serbarê givaş û zextên Hikûmetê, gelê Kurd li vê parçeyê de jî xebatê bi awa û metoda xwe pêşve dibe.

Girîng eva ye ku li bin giranî û qorsayiya kuştin, helandin û şewitandina xak û nîştimanê xwe de serbilind derketiye û dîroka sedsala borî ku rojên herî reş, tal û bitirs yên dîroka Kurdan bûn, bihorand. Niha xortên Kurd, zîndî û hişyarane dengê mafxwaziya xwe digihîjînin guhê dunyayê.

Diyrarde û berçawiyên vî serdemî wekî bicîhanîbûn û pêwendiyên lezgîn, çi din rê nadin ku dîktator li bêdengiyê de Kurdan qir bikin û nehêlin ku deng û hewara wan guhê kesê re bigihîje.

Eva jî li bin siya qorbanîdan û fîdakariya bi sedan hezar şehîdan de bûye ku li pêxema zindî mana neteweya xwe de, li bextkirina canê xwe ku şirîntirîn û pirbehatirîn heyîna wan bû, qisorî nekirin.

Nexa renge wekî ku hêviya dujminên Kurd bû û jêre pîlan dirêtin, Kurd heliyaban û negihîştibane vî serdemî, herwekî wê ku bi ser zaf neteweyên din di vê midehê de hatiye.

Lewra bi cih e ku li vê rojê de tevî kirnoj birin bo canê pak yê nemir Qazî Mihemed, serkarwanê şehîdên Kurdistanê, Sedir Qazî, Seyf Qazî û şehîdên Feyzola begî ku piştî hiloşîna Komarê hatin şehîd kirinê û Dr. Qasimlo, Dr. Şerefkendî û hemû şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê peymanê nû bikin ku heta gihîştin bi armancên bilind yên wan şehîdan ku armanca neteweya Kurd e, rêvîngên biwefa û emegdar bi rêya wan bin. Çimkî bi gotina Dr. Qasimlo, **baştirîn xelat bo şehîdan, dirêjedana rêya wan e.**

**Bila em hemû bihevre silavên emegnasî û rêzgirtinê ji hemû wan malbatan re bişînin ku xweştiviyên xwe li rêya rizgarî û serbilindiya Kurdistanê de ji dest dane û emegdar in bi rêbaza xwe.**

**Silav ji zîndaniyên siyasî yên Kurdistanê ku li rêya armancên Pêşewa û daxwazên rewa û berheq yên wan bo azadî û wekheviyê li girtîxaneyên Komara Îslamî û dîktatorên deverê de ne.**

**Silav li jin û mêrên Kurdistanê ku li hemberî zext û givaş û tepeserkirina rejîma serberedayî û dijî mirovî de, qehremanane berevaniyê ji man û heyîna xwe dikin û bi çok de nahên.**

**Di Rê Û Resmek Berfireh De:**

# Rêz Ji 10'ê Xakelêwê, Roja Şehîdên Kurdistanê Hat girtinê

Roja înê, 10.01.1386(30.03.2007)'an, bona roja şehîdên Kurdistanê û 60'emîn salvegera şehîdkirina Qazî Mihemed û hevalên wî, rê û resmek berfireh li binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê bi pişikdariya Sekreterê Giştî, birêz Mistefa Hicrî û endamên rêberiya Partiyê, heyetên Partî û rêxistinên Kurdistanî û bi sedan kes ji endam, Kadro û Pêşmerge û malbatên wan birêve çû.

Pişka yekem ya rê û resmê seet 9:30'ê sibêdê li ser mezarê şehîdan bi danana taceguleké li ser kêla şehîd Selam Ezîzî ji aliyê birêz Mistefa Hicrî û herweha xwendina çend sirûdan dest pê kir. Paşan beşdarên rê û resmê, bihevre ber bi aliyê hola giştî ya rê û resmê bi rê ketin.

Li salona giştî de, rê û resm bi deqîqeyek bêdengî ji bo canê paqij yê serkarwanê şehîdan Qazî Mihemed û hemû şehîdên Kurdistanê dest pê kir. Paşan birêz **Luqman Mêhfer**, endamê Komîteya Navendî û berpirsê Komîsyona Civakî a partiyê di çend hevokan de bixêrhatina Sekreter, partiyên siyasî, mêvanan û bi giştî beşdarên rê û resmê kir û daxwaz ji birêz Mistefa Hicrî kir ku bi vê boneyê peyama xwe pêşkêş bike. Birêz Misetefa Hicrî di peyama xwe de da zanîn ku Pêşewa li cihê berevanî kirin ji xwe, berevanî ji xwest û daxwazên gelê Kurd kir û bi wê berevaniya bicerg û netirsane ya xwe dersek binirx û ceribînek baş bo xebatkarên rêya rizgariya Kurdistanê bi cih hişt.

Piştî axaftina kek Mistefa, Peyama malbata Pêşewa Qazî Mihemd ji aliyê, **Elî**



**Qazî** ve hat pêşkêş kirinê. Li doma rê û resmê de peyama **PSK – Bakûr** ji aliyê Sekreterê vê partiyê birêz **Mesûd Tek,** peyama **Partiya Azad ya Kurdistanê** ji aliyê cihgirê Serokê vê Partiyê, birêz **Husên Yezdanpena**, , peyama **PDK li Sûriyê** ji aliyê **Nûrî Birîmo**, peyama **lêjneya PDK li Koyê**, peyama **YXDK Îranê** ji aliyê **Irfan Rehnimûn**, peyama **Yekîtiya Ciwanên Demokarat yên Kurdistana Îranê** ji aliyê **Qadir Mêhrfer** û peyama **YJDK Îranê** ji aliyê **Gelawêj Mêhrfer** ve hatin pêşkêş kirin.

Her bi vê boneyê çend peyam ji aliyê rêxistinên siyasî yên Kurdistanî gihîştin desteya rêveberiya rê û resmê ku ji ber kêmbûna demê tenê îşare bi navê wan hat kirinê: **Parta Parêzgaran (navçeya Koyê) Parta Azadiya Kurd li Sûriyê, Parta Zehmetkêşên Kurdistanê (Navenda Koyê), PYDK Sûriyê û Parta Şiyûî a Kurdistanê.**

Hêjayî gotinê ye ku her yek ji helbestvanên Kurd, **xûşke Nahîd Husênî û Fatime Husênpena** bi helbestên xwe beşdarî li vê rê û resmê de kirin.

Her bi vê boneya dîrokî, hunermendê nîgarkêş **Kemal Ethemî,** kewalek ji wêneyê her sê şehîdên rêber pêşkêşî Mistefa Hicrî Sekreterê Giştî yê Partiyê kir, piştre jî çend sirûdên şoreşgerî ji aliyê koma hunerî ya partiyê ve hatin pêşkêşkirin û bi wî awayî rê û resm seet 12:30'ê nîvro bi dawî hat.

# Kîmiyabarana Helebçê, Qonaxek Ji Pirosesa Netewesaziyê Di Îraqê De

**Cemîl Kulahî**
**Wergerandin: Rondik**

Digel pêkhatina dewlet – neteweyên Modern de, pisporên zanista siyasî zaf hewldan kirin ku bigihîjin şiroveyek giştgir û tevalî bo "Neteweyê", wan di şiroveyên xwe de li ser ew fakter û hêvênên ku di pêkhatina netewê de rola yekgirtinê dilîzin, rawestiyan û alavên herî girîng ku li ser de biîsrar bûn, pêkhatî bûn ji: ziman, çand, dîrok, zehnê civakê û hin caran jî regez. Lê rastiya wê eva ye ku ev alavane, bi taybetî li welatên ku derbasbûyiyek împeratorî hebûne, bi kêmî yek digirin.



Bi awayek din pêtir ji vê ku hêvênê yekîtiya neteweyê di destpêkek dûr ya dîrokî de be, diviya di bin zext û givaşa tirombêla dewletî ya modern û li rêya piroseya netewesaziyê de pêk bihata. Lewra neteweyên modern pêkhatî ji nav dilê proseya netewesaziya serdemê modern in, nek berçaviyek hertimî ya dîrokî.

Cehd û xebat bona têkelkirin û helandina netewe û qewmam di nava qewareyekî siyasî de û yekdengkirina wan bi taybetî li warê zimanî ve, bizavek bû ku di sedsala 19'an de nasiyonalîzma Ewropî dest pê kir. Wê îdeolojiyê bi bizivandina hest û seha wan bi nîsbet mijara netewê, di rastî de dixebitî ji rêya pêkhateya yekgirtiyane ya dewleta neteweyî, dezgeha birêveberî, Polîs, Arteş û çêkirina zimanek yekgirtî û fermî bo seranserê welat, eva ku di dîrokê de lê digere, bi awayek destçêkirî çê bike.

Digel derketina mijara neteweyê bi sedema guhartin li jêrxana aborî, civakî û siyasî ya welatên Ewropayî, di dawiya sedsala 18'an ya Zayînî û bi dirêjiya sedsala 19'an de, ji wan welatan de **kûrexaneya helandin** a neteweyan hat çêkirinê û dixebitî di bin navê yekîtiya netewî de, ziman û çandên din ji nav bibin. Ev proseya, anku piroseya netewesaziyê, tenê di çarçoveya Ewropayê de nemaye, belkî çi ji rêya Kloniyalîzma Ewropî û çi jî di warê hizr û ramanên modern de bo aliyên din yên cîhanê jî teşene kir. Bo mînak li hundir û dilê împeratoriyên kevn yên Asyayê wekî Îran û Osmaniyê, pêkhateyên dewlet – Netewe yên modern serî hildan û prosesa netewesaziyê dest pê kir.

Prosesa netewesaziyê û pêkanîna Dewlet – Neteweyan piştî şerê yekem û duyem yê cîhanî û piştî hiloşîna împeratoriya Osmanî di Rojhilata Navîn de lezgînî û bezatiyek bêwêne bi xwe ve girt. Ev pêvajoye pitir ji hemû tiştekê di bin zext û givaşa Rojavayê de bû, ku du meremên sereke li pişt bûn:

1. Rojhilata Navîn di warê aborî û çavkaniyên binerd bi taybet niftê de, dewrek stratejîk hebû.

2. Sedema din eva bû ku Rojavayê bona pêşgirtin ji xurtbûna komonîzmê, gelek Dewlet – Netewe yên bihêz di vê deverê de pêk anîn.

Prosesa netewesaziyê di Rojhilata Navîn de bi du awayan dihat cîbicîkirinê:

**1. Jînosayda Sor**
**2. Jînosayda Sipî**

Jînosayda Sipî bi vî awayî bû ku di welatên wekî Îranê de haşa û înkar ji hebûna neteweyên din xêncî Farsan dihat kirinê û ziman û kultura Fars bi ser hemû neteweyan de hate sepandinê û bêrawestiyan cehda helandina sîstematîk û bi bername ya wan neteweyan li warê zimanî û çandî di nav neteweya serdest de dihat dayînê û her terze delîve û fersendek ji bo geşandina çandî ya neteweyî di wan neteweyan de dihat zevtkirinê. Lê di welatek mîna Îraqê de xêncî jînosayda Sipî, jînosayda Sor jî hatiye cî bi cî kirinê, ku li qeware û çarçoveya kîmyabaran, enfal, bê ser û şûnkirina bikom ya mirovan û bi erebkirina deverên Kurdakincî wekî Kerkûkê xuya dike. Lewra em dikarin bibêjin ku kîmyabarana Helebçê qonaxek e ji prosesa netewesaziyê di Îraqê de. Lê serbarê wan hemû xebat û tekoşîn, givaş, tepeserkirinan, darêtina bernameyên proseya netewesaziyê û Dewlet – Netewe di welatên wekî Îran, Îraq, Turkiye û Sûriyeyê de, bi têkçûn û herifînê re berbirû bûne, ku ev jî vedigere bo vê rastiyê ku avakirina Dewlet – Netewe yan di vê deverê de li ser xwast û daxwaz û îradeya neteweyî ya neteweyên akincî di vê deverê de pêk nehatine, ji ber ku pitir ji her tiştekê bi daxwaza hêzên mezin bona gihîştin bi berjewendiyên siyasî û aborî pêk hatin, lewra tu demekê dewlet – netewe bi wateya rastîn ya xwe di wan welatan de pêk nehat. Bo selimandina vê rastiyê em dikarin îşare bi du nimûne ji nîşaneyên dewlet – netewê bikin:

1. Li pêkhateya dewlet – netewe de, **Dujmin** li derveyî sînorên neteweyî de ye, lê di welatên wekî Îran, Îraq û Turkiyê de li hundirê sînor de ye.

Bi vê wateyê ku neteweyên cihgir di nava wan sînoran de wekî Kurd, Ereb, Turk û Fars dikarin bibin dujminên hev.

2. Di wan dewelet – neteweyên devera Rojhilata Navîn de tu aliyek **qazanc û berjewendiyên neteweyî** ku yek ji ramanên dewlet – neteweyê ye, berçav nagire, lewra Kurd û Ereb yan Kurd û Turk û ... bi sedema van dijberiyên ku di nava wan de hene, bi bêy berçavgirtina berjewendiyên wan netewane dikarin bi hev re şer bikin.

Bi li berçavgirtina wan xalane ye ku pêkhateyên rûyekî yên dewlet – netewê ku ji rêya cîhangiriya Koloniyonalîzma Ewropayî yan xurtbûna raman û îdeolojiyên modern ku di devera Rojhilata Navîn de pêk hatine, bi sedema nebûna jêrxanek aborî – siyasî ya hevgirtî bingeheke paydar û di encam de nebûna "ruha netewî" bi darê zorê ragirtiye, ev yekîtiya rûyekî dê bilez ji hev belav bibe.

Bo mînak, em dikarin îşare bi Îraqê bikin, ku Seddam Husên piştî van hemû kuştin û qirkirinê ku bi merema helandina neteweya Kurd encam dan, heya ku neteweyek yekgirtî ya Erebî di Îraqê de pêkbîne. Piştî nemana desthilata wî, kirîza neteweyî û mesebî bi awayekê li Îraqê de kûr bûye ku Îraq berbirûyê tirs û xofa ji hev hiloşînê kiriye.


Herçiqas ku rejîma Bees ya Îraqê hemû yasa, peymanname û pirotokolên navneteweyî wekî peymannameya navneteweyî ya pêşîgirtin ji bişaftina regezî ya bervara 9'ê Çileya Pêşîn ya sala 1948'an û pirotekola Jinevê, sala 1925'an ku



mifahstandin ji gazên fetisîner, bi jehr û herwiha çekên biyolojîk qedexe û ne yasayî dike, pêpes kir û bona helandin û asîmîlekirina neteweya Kurd dest avête her terze kiryarek nemirovî, kîmyabarana Helebçê ku 5 hezar gorî lê ketin, yek ji wan bû. Nekarîn pirosesa netewesaziyê ku pîlan û kompiloya wê li ser jinavbirina neteweya Kurd hatibû darêtin, bigihîjne encamê û xwe û prosesa wî çûne nava kirsdana (zibilxane) dîrokê. Lewra welatên derdora Îraqê ku welatên xwe kirine bi kûrexaneya helandina neteweyên bindest yên xwe, divêt baş bizanibin ku encamek baştir ji rejîma Sedam Husên ku bo serxistina prosesa netewesaziyê penaya xwe bo her terze cinayetekê bir, nabînin.

www.arsivakurd.org

# Pesendkirina Biryarnameya 1747'an Li Dijî Îranê, Derheq Doza Etomî



Konseya Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, piştî niqaşên zaf roja Şemî, 24.03.2007'an, biryarnameya 1747'ê a derheq doza Etomî ya Îranê, bi piraniya dengan pejirand û li gor vê biryarnameyê çend kes ji deshilatdarên rejîmê û kompaniyayên Îranê jî ketne ber dorpêçê.

Herwiha di vê biryanameyê de hatiye ku nabe Îran bi tu terzekê, dest bi kirîn û firotin yan şandina made û çekan bo derveyî welat bike. Herwiha divêt gişt welatên sozdar bi vê biryarnameyê xwe ji şandin û wergirtina hemû alavan bo Îranê ji her rêyekê biparêzin.

Herwiha nabe tu welatek li warê firotina çek û çolên leşkerî



ve tevî Îranê alvêrê bike û ji hemû welat û navendên malî ên Navneteweyî daxwazê dike ku neçne bin tu soz û qewleke malî û hevkarîkirina aborî bi Komara Îslamî, xêncî armancên mirovdostane nebe.

Harwiha biryarnameya han 60 rojan derfet dide Îranê da ku dest ji dewlemend kirina Uraniyumê berde û were ser mîzê gotûbêjê. Ger Îran vê yekê cî bi cî neke, wê demê dorpêça navneteweyî li warên aborî, siyasî û herwiha zanistî li ser Îranê xurttir dibe.

# Gerek Kurt Di Dîrokê De ...

**Amadekar: Nûredîn Sofîzade**

**16.03.1988:** Balafirên şerker yên rejîma Bees a Îraqê bajarê **Helebçe** ya Başûrê Kurdistanê bombebarana kîmyayî kirin. Di vê kiryara ne mirovane de pitir ji 5000 kes ji xelkê sivîl ên vî bajarî şehîd bûn.

**17.03.1947:** Piştî têkçûna Komara Kurdistanê, 11 kes ji serokên eşîra **Feyzolabegî** li Seqizê ji aliyê dewleta Şahenşahî ya Îranê ve hatne daliqandinê. Kesên îdamkirî di rêveberiya desthilata Komara Kurdistanê de çalak bûn.

**18.13.1995:** Daxistina **Radyo Dengê Kurdistana Îranê** bi sedema givaşa rejîma Komara Îslamî ya Îranê.

**19.03.1979:** Êrîşa hêzên rejîma Komara Îslamî bo ser xelkê bajarê Sine û şehîdkirina sedan kes ji xelkê bê guneh. Newroza wê salê wekî **Newroza bixwîn** hate binavkirinê.

**19.03.1984:** Yek ji Fermanderên PDK Îranê bi navê **Seyîd Teha Îsmaîlî** ji hêza Pêşewa di nava bajarê Mehabadê de ji aliyê hêzên rejîmê ve hate şehîdkirinê.

**20.03.1951:** Neteweyîkirina seneta Nift (Petrol)a Îranê bi rêberiya Serok Wezîrê Îranê yê wê demê **Dr. Mihemed Musediq**.

**20.03.1988:** Rizgarbûna pitir ji 800 Pêşmergeyên PDK Îranê û malbatên wan di nava bombebarana bajarê Helebçê ji aliyekê û êrîşên hêzên rejîma Îranê bo ser Helebçê, Seyid Sadiq û Xormalê ji aliyekî din ve.

**20.03.2003:** Êrîşa leşkerî ya Amerîka û hêzên hevalbend bo ser Îraqê û rejîma 35 salî ya Sedam di vê êrîşê de nekarî pitir ji 35 rojan berxwedaniyê bike û sernixûn bû.

**21.03:** Pêka dîroka **Mad**'an, ev roja wek Roja Newrozê, cejna neteweyî ya Kurdan hatiye diyarîkirinê û yekem roja destpêka sala Rojî ye.

**21.03.1946:** Kovara "**Hawarî Nîştiman**" li serdemê Komara Kurdistanê de hate çap û belavkirinê.

**21.03.1985:** Hêzên Komela Komonîst êrîş kirin ser navenda **Ajvan** ya PDK Îranê ku di vê êrîşê de mixabin 11 kes ji Kadro û Pêşmerge bi navên: **Sidîq Feroxiyan,** Cihgirê Komîteya Navendî ya PDK Îranê, **Ehmed Kerîmiyan**, **Nasir Ebdî**, **Ehmed Husênpûr**, **Rehman Hesenzade**, **Mihemed Rezayî**, **Bextiyar Nasirî**, **Ezîz Xanî**, **Ehmed Emînzade**, **Seyîd Husên Hamidî**, **Nasir Emînî** şehîd bûn.

**21.03.1988:** Taqimek ji Pêşmergeyên PDK Îranê piştî kongira 8'ê ji rêbaza rastîn ya partiyê ladan û navê xwe danîn "PDK Îranê – Rêberiya Şoreşger" ku piştî 8 salan nekarîn xwe xwedî bikin û tevî Mela Ebdula Hesenzade têkilî çê kirin û hatne nava refên partiyê. Lê di rastî de qet bi bîr û bawer tevlî partiyê nebûn, her ew çend kes anko **"Lader"** piştî kongireya 8'an, dîsan roja 06.12.2006'an ji partiyê veqetiyan û vê carê hev bawerê xwe "Mela Ebdula", kesê ku di kongireya 8'an de bi cî mabû, bi xwe re birin.

**22.03:** Roja Cîhanî ya Mifahwergirtin ji Avê, wek çavkaniya jiyanê.

**22.03.1973: Mela Qadir Wêrdî**, Endamê Komîteya Navendî ya PDK Îranê li bajarê Banê de şehîd bû. Ew bo karê rêxistinî li Germiyanê hatibû hundirê welat, hevalekî wî jî bi navê Mihemed Sidîq bi birîndarî kete destê hêzên ewlekariya rejîma Şah.

**22.03.1986:** Hêzên Komara Îslamî êrîşeke berfireh birine ser gundê "Sarde Kwstan" û şerekî dijwar di navbera wan û Pêşmergeyan de pêk hat ku pitir ji 50 kes ji hêzên rejîmê hatne kuştin. Mixabin di vî şerî de 4 Pêşmerge bi navên: **Bayezîd Neberdî**, **Nasir Xizrî**, **Simaîl Ehmedzade**, **Mihemedemîn Mistefapûr** şehîd bûn.

**23.03.1983:** Komkujiya xelkê gundê **Çeqil Mistefa** ser bi bajarê Nexedê ji aliyê hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê ve ku di vê êrîşê de 21 kes ji xelk sivîl şehîd bûn.

**24.03.2007:** Civata Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Hevgirtî di biryara 1747'an de derheq bernameya navikî baykotên li ser rejîma Îslamî ya Îranê xurttir û zêdetir kir û 60 roj derfet daye ku meyandina Uraniyûmê rawestîne.

**25.03.1930:** Yekemîn hejmara rojnam **Rêya Teze** li Erîvanê hate weşandinê.

**25.03.1964:** Êrîşa berfireh ya "Savak"ê bo ser endamên PDK Îranê ku pitir ji 100 kes hatne girtin û dûrxistin.

**26.03.1980:** Bi egera êrîşa hêzên cinayetkar yên rejîma Komara Îslamî bo ser gundê **Qeletan** li bajarê Nexedê, nêzîk 50 kes ji xelkê bê berevan yê wî gundî şehîd bûn.

**26.03.1986:** Heval **Xelîl Mihemedî**, Fermande Lik ji Hêza Hevşar tevî 2 Pêşmergeyên din bi navên **Mihemed Ezîzî** û **Husên Fidayî** li Hesen Avaya devera Hevşar de ji aliyê hêzên rejîmê şahîd bûn.

**27.03:** Roja Cîhanî ya Lîstika Şano.

**27.03:** Roja Cîhanî ya Pirtûkên Zarokan.

**28.03.1979:** Şandeke fermî ya PDK Îranê bi serokatiya Dr. Qasimlo bona gutûbêjê derheq pirsa mafê netewa Kurd li Îranê çûne cem Xomeynî, lê ew daxwazên ku wê şandê anîne ber bas, bê bersiv man.

**28.03.2003:** Piştî eşkerebûna xebata navikî ya rejîma Îranê, şandek ji lêgerên Rêxistina Ajansa Vejena Etomê ya Navneteweyî seredana hêzgehên Etomî yên rejîmê kirin.

**30.03.1947:** Roja sêdaredana **Pêşewa Qazî Mihemed** û **Seyf Qazî** û **Sedir Qazî** li Mehabadê. Ew roja wek **Roja Şehîdên Kurdistanê** hatiye diyarîkirinê.

**30.03.1979:** Referandoma sîstema hikûmetê piştî şoreşa gelên Îranê ku di vê bi nav refrandomê de Komara Îslamî hate sepandin.

**31.03.1943:** Çap û belavbûna kovara **RONKÎ** li bajarê Şamê.

**31.03.1979:** Şandeke PDK Îranê bi rêberiya Dr. Qasimlo tevî Mehdî Bazergan, Serok Wezîrê Îranê hevdîtin pêk anî û projeyek li ser daxwazên gelê Kurd pêşkêş kir.

**31.03.1991:** Piştî çend rojan serhildan û rizgarkirina bajarên Kurdistana Îraqê ji aliyê gelê Kurd, rejîma mirovkuj ya Sedam bi terzeke hovane êrîş kire ser Kurdistanê û bi milyonan kes ji xelkê mişextiyê tixûbên Îran û Turkiyê kir û bi hezaran kesê kal û zarok bûne qurbanî û bi sedema sir û seqemê jiyana xwe ji dest dan.

# Berfirehbûna Nerazîbûna Mamostayan Ji Çi Çavkanî Digire?

**Hemîd Muxtarî**

Mamosta qata herî çalak di civakê de ne, lê mixabin di Îranê de gişt hêz û şiyana wan bona bidestveanîna bijîva jiyanê tê bi kar anîn.



Mamostayên Îranê ku miaşê wan yê mehane nikare bersiva hewcehiyên jiyanê bide. Lewra li cihê vê ku demên xwe ên bêkariyê, mijûlê jêhelbirina astê zanista xwe bikin, neçar in bo birêvebirina jiyaneke asayî li kêleka karê mamostatiyê de, karên din jî wekî zêdekarî yan karê duhem bikin. Di rastî de zêdekarî di nava mamostayên Îranê de bona jiyankirineke asayî wekî hewcehiyeke haşanekirî zêdeyî jiyana wan bûye, berevajî welatên pêşkevtî ku têde mamosta kêmtir mijûlê hînkirinê ne, da ku demeke zêdetir bona nûkirina zanista xwe hebin. Lê mamostayên Îranê heta li demên bêhnvedanê de jî mijûlê karkirinê ne.

Hebûna pirsgirêkên han bûye sebeba wê ku mamostayên Îranê dîsan dest bidine eyankirina nerazîbûna xwe ji rêyên cur bi cur wekî birêvebirina meşên nerazîbûnê û girevan li ber deriyê Wezareta Perwerde yan kombûn li hember bi nav Parlemana Îranê. Her di vê yek meha borî de li çendîn bajarên Îranê de wekî Tehran, Merîwan, Zencan, Kirmaşan û çend bajar û bajarokên din de mamostayan dest bi girev û nerazîbûnan kirine.

Diyar e cara yekemîn di vê heyamê de nerazîbûna aram û aştîxwazane ji aliyê mamostayên Tehranê ve dest pê kir. Lê rejîma Îranê li ciyê wê ku cehdê bona çareserkirina pirsa mamostayan bike, mixabin bi awayekî hovane û bi hemû hêz û şiyana xwe dest avête girtin û binçavkirina mamostayan û ev yeka bû sebebê wê ku mamosta yên bajarên din yên Îranê weke Merîwan, Zencan, Kirmaşan û ... bo piştevanîkirin ji daxwaziyên mamostayên Tehranê û azadkirina wan dest bidne girevgirtinê.

Di vê derheqê de roja Sêşem, (06.03.2007)’an li bajarê Kirmaşanê de 35 mamosta di dema girevgirtinê de ji aliyê hêzên tepeserker ên rejîma Îranê ve hatne girtin. Diyar e li Tehranê de jî hêzên rejîmê bi şevê diçne mala kesayetiyên di nav meşê de û dest bi girtin û binçavkirina wan dikirin û sibêdeya roja din serbest berdidan, eva jî tevî qanûna bingehîn a rejîma Komara Îslamî a Îranê ku têde îzna birêvebirina meş û eyankirina neraziyan bi mifah wergirtin ji çek û çolan hatiye dan, bi xwe jî dijberî heye.

Di rastî de girîngtirîn daxwazên senfî ên Mamostayan, pêktên ji: pejirandin û birêvebirina bê şert û merc ya nîzama hevaheng a dana heqdestê bi karkerên dewletê di destpêka meha Adara sala 1386’an de, cî bi cî kirin û birêvebirina wekheviyê di navbera miaşxworên dewletê, piştgirîkirin ji saziyên senfî, giringîdan bi mamostayan, rakirina dîtingeha xwedî û ne xwedî bûnê li ser mamostayan, damezirandina banka Ferhengiyan, giringîdan bi sîstema perwerdehiyê di Îranê de, dana heqê dengdanê bo saziyên senfî di şêwra bilind a perwerde û hînkirinê di Îranê de.

Eyankirina nerazîbûnê ji aliyê mamostayên Îranê di demekê de ye ku rejîma Îranê ne tenê di astê navxweyî de berbirûyê nerazîbûnên berfireh ji aliyê gişt xelkê Îranê bûye, belkî di asta navneteweyî de jî seba cehdkirina bona bidestveanîna çekên navikî, destêwerdan di kar û barên welatên hevsînor wekî Îraq û Efxanistan û welatên dûrtir wekî Lubnan, Felestîn, Erebistana Seûdî û zaf welatên din, binpêkirina mafê mirovan di Îranê de û di vê dawiyê de jî girtina 15 kes ji hêzên Birîtaniyayî di nava ava Îraqê de ketiye bin zext û givaşeke zaf de. Her di pêwendî tevî perwendeya dewlemendkirina Uraniyûmê ji aliyê rejîma Îranê, roja Şemî, 24.03.2007’an Civata Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Yekgirtî biryarnameya 1747, ku ji aliyê desteya 5+1, ku pêkhatiye ji welatên Amerîka, Rûsiye, Çîn, Birîtaniya û Firansa tevî welatê Almaniyayê hatibû pêşniyarkirin, kete ber dengdanê û bi 15 dengên erênî bê hebûna dengeke nerênî hate pejirandin. Di vê biryarnameyê de 6 roj derfet bi rejîmê hatiye dan ku dest ji meyandina Uraniyûmê berde û were ser maseya gutûbêjê. Ger rejîma Îranê vê daxwaziyê jî red bike, wê demê dê dorpêçên navneteweyî ên aborî, siyasî û civakî li ser rejîmê xurt bibin, ku bandora rasterast û nerênî li ser rewşa jiyana xelkê Îranê dike.

Erê gelo bi rastî ger rejîma Îranê demokratîk û gelî ba û li hember xelkê de xwe bi berpirsiyar zanîba, li ciyê vê ku dahata neteweyî a xelkê Îranê di rêya bidestveanîna çekên etomî, destêwerdan di kar û barên welatan de, birêvebirina manorên leşkerî ku ji bo her yek ji wan bi milyonan dolar tê mezaxtin, ev dahata zêdeyî miaşa mamosta, karker, nojdar û giştxelkê Îranê kiriba, çêtir nebû?!! Da ku ew jî bikarin bibne xwediyê jiyanekî xweş û rihet. Lê rejîma Îranê li mêjdem e ew rastiye jêre eyan bûye ku xelk piştevanî ji îdeolojiya wê nakin, lewra neçar e bo domandina temenê xwe, xwe di warê leşkerî de bihêz bike.

Divêt were gotin ku bersiva rejîmê bo daxwazên mamostayan çi erênî û çi jî nerênî be, dikare girîng û xwedî bandor be, çimku ger bersiva rejîmê erênî be, zêdebarê xirabbûna rewşa aborî a dewleta hakim bi ser Îranê, ew yeka dikare zêdetir rejîma Îranê li warê aborî ve bixe bin zext û givaşan de, çimku di Îranê de tenê mamosta ninin ku xwedî miaşek kêm in, belkî piraniya karkerên Îdarî bi vî derdî dinalînin û vê demê ew jî dê daxwaza zêdebûna heqdestê xwe bikin. Rejîma Îranê bi domandina van siyasetên xwe ên têkderane, qet nikare daxwazên xelkê bide cî bi cî kirinê. Ger bersiva rejîmê nerênî be, vê demê dê pêvajoya nerazîbûna mamostayan xurttir bibe û rejîm jî nikare heman liv û riftara ku tevî tex û qatên dinê yên Îranê wekî karkeran dike, bi nisbet mamostayan jî bimeşîne, çimku ger mamosta di Îranê de tenê heyameke kurt dest ji karê xwe berdin, vê demê giştxelkê Îranê seba girêdayîbûna xwendingehan dê dest bidne eyankirina nerazîbûnê.

Bi kurtî, îro rojê rejîma Îranê hem di asta navneteweyî û hem jî di asta navxweyî de li bin zext û givaşan di giştwaran de ye û ger mirov rastemêzane çav ji wan guhertinên çend salên borî di cîhanê de bike, jêre eyan dibe ku rejîma Îranê ji çarenivîseke baştir ji rejîma Bees a Îraqê û rejîma Taliban nabe.

## Sunetkirina Mêran Rêçareyek Beş Ji Bo Pêşîgirtin Ji Xurtbûna Nexweşiya Îdzê

Saziya cîhanî a saxlemî û bernameyên xebat li dijî xurtbûna Îdzê, ya ser bi Rêxistina Neteweyên Yekbûyî dibêje ku sunetkirina mêran bi terzeke berçav, wan ji tûşbûn bi nexweşiya Îdzê diparêze.

Ev nûçeya piştî lêkolînekê hate ragihandin ku li vê dawiyê de nîşan da ger mêrek were sunetkirin, tirsa tûşbûna vî bi vîrûsa “HIV”ê li dema hebûna pêwendiyên sîksî tevî regeza hemberî xwe bi qasê %60 kêm dike.

Tê texmînkirinê ku sunetkirina mêran di asteke berfireh de dikare canê pitir ji 3 milyon kesan di 20 salên pêşîn de ji mirinê rizgar bike.

Vir şûn de sunetkirina mêran weke beşekî girîng ji kar û xebata saziya Neteweyên Yekbûyî bona pêşî girtin ji berfirehbûna Îdzê dibe.

Lewra li çend welatan de ku astê tûşbûn a bi “HIV”ê li serê ye, bikarbirina vê rêyê dikare encamên gelek baş hebin.

Lê pispor û kesayetiyên saxlemiyê dixwazin peyama wan rohn be û ragihandine ku sunetkirin tirsa tûşbûn bi îdzê ji nav nabe û dibe mêr ji rêyên pêşî girtin ji tûşbûn bi “HIV”ê weke mifah wergirtin ji kandom û dûrîgirtin ji kar û riftarên nebaş.

Daxwaz û pêşniyara pispor û karnasên navneteweyî bi giştî li pêwendî tevî wan welatan e ku tûşbûn bi Îdzê di nava mêrên ne nêrbaz di wan welatan de li astê serê de ye.

Rêxistina Saxlemiya Cîhanî û Rêxistina Neteweyên Yekbûyî dibêjin di van herêman de ku bi giştî astê sunetkirinê kêm e, dibe sunetkirin bi awayê herî zû li ser wan were encamdanê.

Rêxistina Saxlemiya Cîhanî û rêxistina Neteweyên Yekbûyî herwiha zêde kirin ku carê tu belge û senedek li ber dest nine ku nîşan bide sunetkirina mêran heya çi astekê dikare pêşî ji tûşbûna mêr û jinan bi nexweşiya Îdzê bigire.

# GAZINC Û GILÎDARÎ



ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Gazinc û gilîdarî her çend ku neyên wateya bedbîniyê bi xwe be jî, xwe di bin sîwan û hevhîkariya wê de didin der. Di bingeha gilî û gazincên mirov de, dîsa nerazîbûneke veşartî ya ji jiyan, cîhan û mirovahiyê heye.

Jîxwe kesê/a gazinoyî tu kesî û tu tiştî nahebîne û naecibîne. Bi awayekî reşbînî nêzîkî her tiştî dibe. Her tiştî û herkesî bi pêşdaraziyên vebir û misoger dinirxîne. Bûyer, qewam û lêqewmînên civakî û xwezayî li gorî hestên xwe şîrove dike. Gotina kin gilîdarî nexweşiyeke êşdar û bêderman e. Hem xwediyê xwe û hem jî dost û yarenên xwediyê xwe dêşîne; wa zivêr û bêzar dike.

Victor Hugo: dibêje : "Li cîhanê tiştê herî baş e xweşdîtin e," Bi rastî, xweşdîtin û xweşbînî dijminê reşbîniyê ne. Ango peyva "xweşbînî" dijwateya peyva "reşbînîyê" ye. Reşbînî, hestek wisa neyinî ye ku her gav jiyan û cîhana mirovan ji asayîbûna xwe reştir û bedtir nîşan dide. Xweşbînî jî her gav ne tiştekî rast û erênî ye. Dibe ku hestên xweşbîniyê jî gelek caran mirov ber bi xapandinê de bidehfîne. Lewre ew jî jiyan û cîhanê bi awayekî awarte xweş û çak nîşan dide. Çawa ku reşbînî ne hesteke erênî be, xweşbînî jî ewqasî ne hesteke neyinî ye. Belê ne rasteqînî ye jî. Ya rast ew e ku xweşbîniya herî neçê dîsa jî ji reşbîniya herî çê, çêtir, baştir û erênîtir e. Lewre hizr û hest reşbînîn, mirov ber bi dijminatiya jiyanê; belê yên xweşbîn, mirov ber bi dostanîû hevalbendîtiya jiyanê ve dike.

Kesên gazinoyî ji ber bedbînî û xeydokiya xwe, tu car nikare wekî kesekî/e hêvîdar, çêj û tamê ji jiyana asayî wergire an kêf û şahiyê bide derûdora xwe. Di cîhana xwe ya reş û tarî de xerq dibe. Heta dixwaze herkesî bikişîne nava wê jiyana xwe ya tar û mar û malikwêran. li gorî wî/wê her tişt bêqîmet û beredayî ye.

Bi rastî dilxweşî û hêvîdariya mirov girêdayî ramana mirov e. Jixwe ku hêvî û utopyaya (nîgaşa) mirov nemîne, ne tu wateya jiyanê dimîne û ne jî tu kêf û dilxweşiya dinê. Wekî ku Emîle Zola dibêje : "Ger ku hêvî nemîne, zewqa jiyanê jî namîne. Mixabin îro ev bedbînî, bêhêvîtî û gilîdariyên ku dibin sedema jihevketin û rûxandina civakê, her yek jidestçûna nirx û hêjahiyên me yên mirovî û neteweyî ye. Ev kambaxiya hanê di civakê de bi hemû tirsnakî û erjengiya xwe, xwe dibeliqîne. Û gel û civakê tengezar dike. Bi vî awayî pêwendiya navbera takekes û civakê ya rojane jî dikeve tengaviyê. Madem ku pirsgirêk ji aliyê mirov de pêk tê, naxwe çareserî jî dîsa di destê mirov de ye. Ji bo wê divê mirovên ku xwe berpirsiyar dihesibînin, rojekê berî rojekê xwe ji van nexweşiyên hestko û hêvîkuj reha bikin.

Tu derî li kîjan sazî, dezgeh, partî û rêxistin demokratîk an jî komeleyên şarwer (sivîl) vedikî, lome û gazinc jê difûrin. Ew saziyên ku ji tune de, li ser xwîn, xwedan û keda kesên fedakar û cefakar hatine avakirin, hin jê dikin ku wan bi kevneşopiyên gilî, gazinc, lome, helwest, feraset û nêzîkayîtêdanên kevneperest birûxînin û bifeşikînin. Ev ne tiştekî rewa ye. Dibe ku mebest û armanc wan ne xerab be. Belê xerabiyên ku ji destê mirov hasil dibin, hewce nake ku her gav bi zaneyî bêne kirin. Gelek tişt ji ber nezanî û bêhemdiyên mirov û her wiha ji dest bedbînî û nexweşiyên mirov pêk tên. Jixwe derdê bêderman jî ev e.

Çi mirov û çi jî civak dibe; gava ku nexweşî tevê derûniya mirov serobin dike, mirov nizane ku kî çi an jî çawa dike. Der barê vê yekê de metelokek gelêrî ya balkêş ku vê yekê baş rave dike heye: "Demekê mirovekî bitir gewî û dewlemend hebûye. Rojekê tê, hevsera (jina) wî dimire. Hê cendekê wê li ser kevirê teneşîrê ye; zilamê me radibe diçe hundirê malê dest davêje bermaliya (qerwaşeya) xwe ya keç û li stûyê wê siwar dibe ku pê bileyîze. Di heman katê de qîza wî ya mezin ji nedît ve derî vedike û dadide hundirê malê. Belê ku çi bibîne...? Ne kin û nedirêj dike. Bi hêrs ê gazinc dibêje: "Wî ez nemînim bavo, ma ev çi ye!? Tu çi dikî? Hê cendekê diya min di nav destê me de ye, tu li kêfa belek digerî...!' Bav, xwe li xeşîmiyeke reben û bêrî datîne û bi konetiyekê bersiva keça xwe dide û dibêjiyê : Rast e keça min, tu mafdar î. Belê ma ji kula diya te re qey hiş di serê min de maye ku ez dizanim ez çi dikim ?"

Îcar bi rastî mirov gelek caran ji kêmasî û nelirêtiyên xwe re li hincet û spartekên nederbasbar digere. Û dek û dolabên mezin digerîne.

Helbest

## Xozan daxê



Serbest Urmiye

De were evdalê zeynê
Bistirêne dîsa
Ji kesera xozan daxê,
Car din, strana wê
Li ser
Qeymetê mêra û selefê siwaran
Ên
Ku dibêjî
Venda kirine te
Di orteya meyadanê,
were
Ne venda ne
Bistire
Da ku
Bêjim ji
Salix û sûlixên
Şenge siwarên venda bûyî
Ji qeymetê mêran yên bi ser kaniyê
Bigere li hêla Amedê
Heya Dêrsima bi kovan
Xozan daxê ne tev
Zîlana ser bi reş û
Urmiya gola xwînê
Binihêre Çarçiraya ser bilind
Yê di bin sêdarê de ne
Şenge siwarên min û te
Ne bizir û venda nabin
Di hembêza pîre dayîka niştîman de
Tevlî hizr û ramana
Lorîkên aştiyê bûne ew
Bistire evdal
Da ku
Bêjim ez
Ji selefê siwaran
Bi nav û nîşan
Çeleng siwarên bi hesp û zîn
Ên Şore jina Feyzula beg,
Çar çirayên Mehabad û azadiyê
Binihêre .....
Kurê geliyê Qasimlo,
Mamostayê aştiyê
Egîdê Terexe
Ala hilgirê ronahiyê,
Dest dane hev
Yên ku tu car
Ne bizir û venda nabin
Bûne tîrêjên roja azadiyê
Û ....
Mizgîna biharê tînin
Her tim

**Pispor û şareza li warê ragihandinê, birêz Mecîd Heqî:**

# Li Civaka Îranê Û Nemaze Di Rojhilata Kurdistanê De Ji Ber Nebûna Sîstemek Demokratîk Û Yasayek Îroyî Li Gor Mercên Cîhana Global, Toleransa Ji Dayîkbûna Weşanên Serbixwe Nehatiye Holê

***Xwendekarên hêja yên Agirî, me vê carê jî bi hewce zanî ku derheq rola ragihandinê bi giştî û bi taybetî rola ragihandina Kurdî li bizava neteweyî a Kurd û asteng û girêpêçkên hember medyaya Kurdî, hevpeyvînekê bi pispor û şarezayê warê ragihandinê birêz Mecîd Heqî berpirsê ragihandina PDK Îranê li derveyî welat re çê bikin. Kerem bikin em û hûn bi hevre vê hevpeyvînê bixwînin.***

**Hevpeyvîn: Dara Natiq**


Rêzdar: Mecîd Heqî

**Hûn bi giştî ragehandinê çawan pênase dikin?**

Pênaseya ragehandinê di çend mêzegehan de tê pênasekirin: Di mêzegeha navbera du (2) mirovan de mirov dikare ragehandinê diyalog, axaftin û şandin û wergirtina peyamê ji mirovekê bo mirovek din û beravajî wê jî bibîne. Di wê bûyerê de **naverokek** hatiye û çûye ku wateyê dide pêwendiyên du aliyan û beşek li hewcehiya mirov tê berawirdkirin. Di mêzegeha civakî de ragehandin bi wateya wan kod, naverok yan peyv, wêne, sembol û ... tên ku pêkanîna nasnameya havbeş a endamên civakê, bihêzkirina wê û pêşvebirina wê nasnamê dikaribe bê şirovekirin. Derhênan (production), çand, aborî û birêveberî hewcehiya bingehîn e ji bo civakek tenahî û rihet. Ji bo gehîştin bi wan bingehan ragehandin rola xwînê di laşê mirov da dilîze ku hewcehiyan û şiyanan bi hev girê dide. Ragehandin bi kurtî bingehê jiyana civakî û bi hevre bûnê ye.

**Kekê Mecîd, hûn astê pêşveçûna medyayên Kurdî çawa dinirxînin?**

Weşana Kurdî di çend salên derbazbûyî de pêşveçûnek zaf ji aliyê çandî ve bi xwe ve girtiye. Hejmara rojname, kovar, weşanên elektronî, malperên înternetî û çend medyayan her roj zêde dibe. Lê di warê naverok û çewaniyê de hewcehî bi karê zêdetir heye. Em dikaribin medyaya Kurdî bi 3 beşan parve bikin: 1. Ew weşanên ku li Herêma Hikûmeta Kurdistanê derdiçin, herçend ew ne li gor standardên cîhanî ne, lê digel wê jî gavek mezin di pêşveçûna weşana Kurdî de hilgirtine. Edebiyat, ziman û çewaniya hizrkirina weşanên Başûrê Kurdistanê hêdî hêdî ji rewşa opozosyon bûn û binerdîbûnê ber bi rojnameyên medenî û pisporane ve diçin. Medyayên Kurdî li Başûrê Kurdistanê bi awayekî berfireh bi şêweya pirmedyayî (cross media) derdiçin, wate hem bi awayê çap û him jî bi awayê înternet. Lê stiruktora wê medyayê mîna hemû xwestekên pirmediyayiyê berçav nagirin ku ew jî di pêvajoyek dirêj de ne.

Li navxweyê Kurdistanê – Rojhilata Kurdistanê – medyayên kurdî rola civaka medenî partî û saziyên opozîsyonê dilîzin ku ne tenê pirsgirêkên civakî, deng û bas, nûçe û babetên pêwendîdar bi jiyana mirov dixin ser ziman, li hember bûyerên civakî û siyasî de helwestê xuya dikin. Li dereveyî welat medyayên Kurdî digel zafbûna hejmara wan xasmayî ser înternetê bi destê bênasnameyî, şirovê û felsefeya hebûnê dinalin.

**Bi baweriya we ragihandina Kurdî, ragehandineke serbest e yan na?**

Serbestiya ragehandinê pirseke nisbî ye. Em eger Başûra Kurdistanê berçav negirin, demekê em dikaribin wê yekê berhev bidin ku Kurd xasmayî li Rojhilatê Kurdistanê xwediyê desthilata xwe be û şansê xwe ceribandinê hebe. Ragihandinên niha yê pêwendîdar bi Rojhilata Kurdistanê serbestiya bi wateya bê alîtî gelek nînin. Ew ragehandinên nava welat ji aliyê sazî û rêxistinên medenî diweşin, lewma hilgirê bîr û hizra wan e û herwisa Komara Îslamî jî rê nade bê alî yan serbest bimînin. Li derveyî welat ragehandinek wilo nine ku mirov bikaribe wek nimûne bas bike û asta serbestiya wana binirxînin. Ji ber ku piraniya ragehandinên dereveyî welat ku weşanên Înternêtî ne, ji aliyê takekesan ve der diçin û pîvanên ragehandinê tejî nakin. Lê ger em wan ragehandin jî bizanibin, bandora hizra siyasî civakî ya xwediyên wan di weşandina babetan de xuya ye û serbestiya wan dibe jêr pirsyarê.

**Asteng û girêpêçKên hember medyayên Kurdî çi ne?**

Ragihandina Kurdî di hember çend pirsgirêk û asteng (çalêş)ên giring de rû bi rû ye, ku hetanî astek bilind astenga medyayên Rojhilata Navîn bi giştî ye. Li serdema Înternet û gilobalîzasyonê (cîhanîbûnê) çanda çend medyayî û weşana elektronîk hêdî hêdî cihê weşana çap digire û medyaya dîcîtal dibe weşana herî bingehîn ya Kurdî. Guhartina han digel xwe çend guherînan di astê teknîkî, civakî û çandî de pêk tîne ku em bi kurtî dikaribin wana bi awayê jêrîn nîşan bikin:

**1. Jimare bûna ragehandinê**: Di weşana çapî de ku di rastî de şeklek ji çanda civakê jî bi xwe re digire, piroseyên çapemeniyê dirêj û temenê wan zêde bû, ji bilî wê yekê medya bi awayê “zext” (Hard) dihat weşandin, wate çap dibû. Di serdema weşana dîcîtal de medya ku em dikaribin bêjin êlêmentên medyayê bi awayê nerxok (soft) û kodên kumpiyoterî wate 0 û 1 tên weşandin û ewa jî tevî xwe hin pirsên taze û dergehên nû divekin.

**2. Modûlarîzasyon**: Medyaya berê an weşana çapî hevdem tenê dikaribû bi yek awayî derbiçe. Piştre dahênana naveroka wê mirov nedikarî tu guhartinek biçûk yan mezin bêy guherîna hemû weşanê pêk bîne. Di weşana dîcîtal de heman naverok wêca nivîs be, wêne be yan multîmedya dikaribe hevdem bo çendîn awayan û li gor cîh û mezinî û biçûkiya weşanê der biçe. Ji bilî wê, naveroka weşanê bi awayê cur bi cur li nav modûl (çarçove)yên cur bi cur parve bike û biguherîne û berfireh bike.

**3. Otomatîsiyon**: Weşana berê bi giştî bi awayê manûal yanî destî dihat amadekirinê, lê niha weşan bi awayekê hatiye automatîkkirin ku mirov dikaribe di demeke nêzîk de heman naverokê bi çendîn awayan biweşîne û bo nimûne wêne, reng û deq bi awayên automatîk di dema weşanê de qalib û çarçoveya xwe ya weşanî bi dest tînin.

4. Hatin guherîn (adjustability): Weşana niha ji ber dîcîtalbûna wê dikaribe li gorî temenên cur bi cur naverok, şêwaz, grafîk û zimanê wê li gor temen, girêdahiya civakî, kar birin û cîhê weşanê bihê guhartinê.

5. Kod guherîn (encoding): Li weşana

www.arsivakurd.org

niha tenê kodên kampiyoterî nehatine guhartin, belkî bi pêşveçûna weşana dîcîtal ziman, çawaniya bikarbirina peyvan û senbolên pêwendî (komonîkasyon)a mirov tê guhartin, lewma ev pîvanên berê yên weşanê nikaribin bibin pîvan bo weşana nû. Guhartina ziman û senbol dibe hegerê guhartina hizr, çand û formûlên kar û çalakiyên aborî û siyasî yên civakê.

Weşana Kurdî ji ber hegerên berê asteng – ne bi awayê nerêtî - giringe wek xwe guncandin digel serdema dîcîtal û pir medyayiyê û her wisa astenga amadekirina civakê bo bikaranîna medyayê bi awayek rast rûbirû ye. Tirsa wê heye ji ber nebûna çanda xwendina serdema medyayê gelek sermayeyên civakî, kulturî, aborî û dîrokî ên me ji dest herin. Ew mijare mixabin hin kûr e ku di çarçoveya wê hevpeyvînê de cîh nake û hewce bi konferans û semînarên berfirehtir dike.

**Li gor rola berçav û bibandor ya ragehandinê li ser bûyer û guhartinên cîhanê, bi raya we ragehandina Kurdî heya çi qasekê kariye rolekî erênî û bibandor li ser xebata neteweyî û nasandina doza gelê me bi cîhanê bilîze?**

Ji bo ku mirov bikaribe bersiva wê pirsyarê bide, hewce ye pêdaçûnekê bi asta ragihandina Kurdî bi zimanên nawnetewî xasmayî zimanê Îngilîzî bike. Di vê derbarê de em wek mînak pirsa Kurd li Rojhilata Kurdistanê dê bînin. Erka bingehîn ya medyayê pêkanîna nasname û "hoviyeta" havbeş ya navbera endamên civakê ye, ji bilî wê yekê erka weşana Kurdî ya ku bi zimanê biyanî derdiçe, nasandina pirsgirêka netewî bi awayê zanistî, teorîk, kolektîv û rojnamevanî ye. Yekem bi hegera wê ku medyaya Kurdî gelek direng dest bi weşanê bi zimanê biyanî kir, hîna nekariye cîhê xwe di nav civaka navnetewî de weke pêwîst bike. Li gor gelek serekaniyên zanistî yên Ewropî pirsa Kurd li Îranê pirsa netewî nine û mafê Kurda wek netewe nayên pêpeskirin, belkî sîtema ser Kurdan li Îranê sîtemek giştî ye ku ji aliyê desthilatê heman sîtem li ser netewa Fars jî heye. Ewa di şûna diyarîkirina rola medyaya Kurdî erka wê medyayê girantir dike û hewce ye weşanên Kurdî xasmayî weşanên PDK Îranê giraniyek mezin li ser teorîzekirina pirsa Kurd bo navendên navneteweyî bixen û li niha zêdetir pirsa Kurd çi wek pirsek netewî, û çi wek pirsek mirovanî, siyasî û kulturî bidin nasandinê.

**Gelo medyayên Kurdî heya çi qasekê karîne xizmetê bi geşekirin û pêşveçûna çand û wêjeya Kurdî bikin?**

Di vê derheqê de xasmayî televîzyonên Kurdî xizmetek mezinkirine. Bi jîndar kirina diyalekt û lehceyên Kurdî û bikaranîna wan di weşanên deng û reng de çand û wêjeya Kurdî hem giştgirtir bûye û hem jî Kurdên hemû deverên Kurdistanê bi awayek zimanî û çandî zêdetir bi hev hatine naskirinê, ewa jî gavek gelek giring û hêja ye ku dibe hegera geşekirina ziman û çanda hevbeş ya Kurdî. Lê di çapemeniyê de ew giraniye nehatiye dan û her lehceyek bi awayekê tê weşandin, wek ewa ku kurdan du (2) zimanên cuda hebin. Di vê derbarê de gava Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê bo weşandin bi zaraveya Kurmanciya Jorîn herçend gavek girîng, lê carê ne tewaw e. Xasmayî eger bihê û zaraveyên kurdî di weşanan de têkel nebin. Mirov dikare bo nimûne li rojnameya Kurdistanê de bi awayê kurmanciya jorin û pîtên Aramî biweşîne, ji bo ku welatiyên başûrê **Kurdistanê** fêrî wê zaravê bin û herwisa heman kar bo Kurmanciya Jêrîn bi tîpên latîn di Agirî de jî bike. Bi vî awayî dergehên yek zimaniyê bi hev vedibin û zimanê Kurdî bi destê Kurdan ji hev naqete.

**Çima gelê me li Rojhilata Kurdistanê heya niha nekariye xwediyê ragihandinekî bi bandor û serbixwe be?**

Serxwebûna ragihandinê girêdayî bi çendîn faktora ye ku yên herî girîng di vê barê de bûna azadî û aboriyê ye. Li Rojhilata Kurdistanê bi hegera nebûna azadiyê û nebûna tenahiya rojnamevanî û weşanê, ragihandinên serbest nikaribin şansê li dayîk bûnê hebin. Digel wê yekê jî faktorek giring ku kar dike li ser nebûna ragihandina serbixwe, nebûna bingehek bihêz ya aborî ye, ku bikaribe piştgiriya ji dayîkbûna ragihandinek serbixwe bike.

Di welatên weke Îranê de weşan û ragehandin ji bo parastina hebûna xwe rêyên wan ji bilî xwe girêdan bi aliyekê gelek girtîne û lewma nikaribin serxwebûna xwe jî biparêzin. Carê li civaka Îranê û nemaze di Rojhilata Kurdistanê de ji ber nebûna sîstemek demokratîk û yasayek îroyî li gor mercên cîhana Global, toleransa ji dayîkbûna weşanên serbixwe nehatiye holê. Ji bo wê yekê pêdivî ye rewşenbîr, çalakvanên civakî û aborî bi hevre xebatê bikin da ku bikaribin zemina serxwebûna weşana Kurdî pêk bînin. Bona weşana serbixwe ne tenê bi qazancê civaka medenî di Kurdistanê de ye, belkî berjewendiyên mezin bi sêktore aboriya civaka Kurdistanê digehîne.

**Hûn zafbûna weşan û medyayên Kurdî bi giştî û bi taybetî li Kurdistana Başûr çawan dihesibînin?**

Gelê Kurd bi giştî têniyê ragihandin, nûbûn û agehdarî li ser rewşa Kurdistan, dever û cîhanê heye. Ragehandina Kurdî her çiqas jî zaf be, hîn hemû pêwîstiyên civaka Kurdî nikaribin pir bikin. Helbet divê ewa jî bê gotin her weşanek xwe nikaribe di çarçova ragihandinê de dabinê, lê digel wê çendê jî eger ew weşanana xwediyê strûktor, bername û armancên rohn bin û bikaribin xwendevan û alîgirên xwe yên beşên cuda cuda yên civakê bi dest bînin, dikarin li pêşveçûn û berfirehkirina seha havbeş û nasnameya havbeş ya Kurdî di nav netewa me de xizmetek mezin bikin.

**Ji bo nûjenkirin û erênîkirina ragihandina Kurdî divêt çi gavek bêne avêtin?**

Ragehandin bêy bûna civakek ku xwediyê saziyên civakî û medenî ye û bêy bername û stiratêjiyên dirêjdem û kurtdem nikaribe nûjen be. Em diviya wê rastiyê berçav bigirin ku em niha di despêka piroseya gilobalîzasyonê de ne, ji bo ku em bikaribin tevî karwanê pêşveçûna cîhanê bin, diviya ragehandin û weşana Kurdî di astekê de be ku bikaribe tevî derdora xwe rikeberiyê bike û hewcehiya ragehandin, zanîn û bidestanîna zaniyariya welatiyên Kurd berawird bike. Lewra ji bo ku me karîbe bi awayekî kolektîv xwe nûjen kiribe, xasmayî Hikûmeta Herêma Kurdistanê diviya navendek ji bo pêşveçûn û standardkirina weşana Kurdî saz bike da ku ragehandina Kurdî li tehlûkeya tengejeya bê sîstemiyê rizgar be. Ji bilî wê yekê saziyên weşana Kurdî diviya berî her tiştekê di nav xwe de li ser hindek kodên havbeş ji bo pêşveçûna karê xwe û nûjenbûna paralêl pêk bên.

**Erk û wezîfeyên rêxistin û aliyên xwedî desthilat yên kurd li hember medyayên Kurdî çi ne?**

Wê gavê navendên desthilatdar yên Kurdî serekaniya destpêkî yên aboriya weşanên Kurdî ne. Ez bawerim yek ji erka wan navendana baldan li ser pirsa çawaniya ragehandinê ne tenê li gor naverokê, belkî li gor berhema fîzîkî ya wê ye. Navend û rêxistinên han dikaribin bi alîkariya hev îmkana pêkanîna navendek hevbeş ku têde berjewendiyên netewî serî her tiştekê be, alîkariya ji dayîkbûna weşanek serbixwe û modern bikin. Ewa ku gelek girîng û balkêş e mixabin medyayên Kurdî piraniya wan "hizb zede" bûne û di şûna rengê netewî rengê hizbî di wana de zaftir derdikeve. Lewma civaka Kurdî li serdemê hişyariya netewî de digel wê ku seha netewî ya wê pêşve çûye, bi awayek gelek cîhê metirsiyê bi ser partî û rêxistinan de hatiye bilokekirin. Ewa jî erka navendên xwedî desthilat girantir dike.

**We bi giştî ji bo ragehandina Kurdî çi gotinek heye?**

Ragehandina Kurdî serdema ewa farsî dibêjin "guzar" de derbaz dike. Di 10 – 12 salên derbazbûyî de ragehandina Kurdî gelek guhartin bi xwe dîtine. Tehlûkeya ku wê serdemê ji bo weşana Kurdî heye, ji navçûna beşek zaf li arşîva netewî û dîrokî ya me ye. Bi sedema nebûna sîstemek standard ji bo arşîvkirin, ragirtin û her wisa nebûna navendên xwedî îmkan weşanên Kurdî xasmayî ên elektronîk ên ku piştî midehekê li holê rabûne, hemû babet, arşîv, wêne û dewlemendiya xwe ya naverokî digel xwe birine. Ewa jî cihê nîgeraniyek gelek mezin e. Ragehandina Kurdî hem di navxwe de û hem jî rû bi civakê diviya di pêya pêkanîna şiyana xwendina medyaya nû be. Bo wê yekê hewce bi semînar, gotar û lêkolînên zaftir hene.

www.arsivakurd.org

agiri

**Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail:**
**agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@googlemail.com**



# 178'emîn Zandora Destpêkîn A Siyasî – Leşkerî Ya Pêşmerge Bi Dawî Hat



178'emîn zandora destpêkîn a Siyasî – leşkerî ya Pêşmerge, demjimêr 9:30'ê roja duşemî, 06.01.1386(26.03.2007)'an, bi amadebûna birêz Kawe Behramî, endamê Komîteya Navendî û berpirsê Komîsyona "Siyasî – Nizamî" ya PDK Îranê, Seyîd Birahîm Haşimî, endamê Komîteya Navendî ya PDK Îranê û berpirsê Navenda 2 a Kurdistanê û hejmareke berçav ji Kadro, Pêşmerge, berpirs û mamostayên Fêrgeha siyasî – leşkerî, rê û resmek hêja birêve çû.

Rê û resm bi sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb"ê û ragirtina deqîqeyek bêdengî ji bo canê paqij yê şehîdên rêya azadiya Kurdistanê dest pê kir. Piştre birêz Kawe Behramî, bi vê hincetê basek pêşkêş kir ku têde piştî pîrozbahiya Newrozê û hatina sala nû, pir bi dil pîrozbahiya bi dawîhatina vê zandorê ji tev pêşmergeyên beşdar kir.

Behramî, di doma axavtinên xwe de bi kurtî balkişande ser rewşa niha ya Îran û herêmê û her wiha guhertinên bi ser de hatî û îşare bi serkeşiyên Komara Îslamî derheq hewl dan bona destveanîna çekên Etomî kir û rejîmek wiha bi xeterek mezin bo ser tenahiya herêmê dazanîn.

Piştre rapora fêrgehê ji aliyê yek ji mamostayên fêrgehê ve hate pêkêş kirin. Yek ji hevalên beşdar di zandorê jî peyama dewreya 178'ê pêşkêş kir.

Beşa dawîn a rê û resmê dana xelatan bi wan pêşmergeyan bû ku di heyamê zandorê de beşdariyeke çalak û serkevtî hebûn. Rê û resm bi helbest, sirûd û stranan ji aliyê beşdarên zandorê ve hatibû xemilandin û seet 11'ê sibê di nava govend û xweşiya beşdaran de bi dawî hat.

# Hejmarên Nû Yên Kovarên: Bîrî Xwendekar, Jinan Û Tîşk Derketin



Hejmara nû û duhem a kovara **Bîrî Xwêndkar** ê ku Yekîtiya Xwendekarên Demokerat yên Kurdistana Îranê diweşîne, çap û belav bû.

"Bîrî Xwêndkar" ku kovareke werzî, ronakbîrî û giştî ye û hejmara nû taybet e bi demsala zistanê a sala 1385(2007)'an, pêkhatiye ji sergotar û beşên siyasî, ronakbîrî û çand û hunerê ku di her beşekê de hin bas û babetên girîng û dewlemend hatine weşandin û dikevin ber çavên xwendevanan.




Herwiha hejmara 16'an a kovara werzî a **Jinan**, taybet bi meha Reşemê, ku ji aliyê Yekîtiya Jinên Demokrat yên Kurdistana Îranê tê birêvebirin, kete ber çavê xwendevanên xwe.

Naveroka hejmara nû a Kovara Jinan, pêkhatiye ji sergotar û babetên cur bi cur yên civakî, siyasî, çandî, wêje û herwiha kar û çalakiyên YJDK Îranê.




Herwiha Hejmara 18'an ya **Tîşk** ku kovarek siyasî – rewşenbîrî ye û komîsyona lêkolîn û hînkirina PDK Îranê diweşîne, kete ber çawê xwendevanên xwe.

Kovara Tîşk ku ji 118 rûpelan pêk hatiye, sergotar, çend babetên siyasî, hevpeyvîn û rewşenbîrî li xwe de cih daye.

Em wekî malbata Agirî, destxweşî û mandînebûniyê ji desteyên weşan û tev xebatkar û zehmetkêşên Kovarên Bîrî Xwendekar, Jinan û Tîşkê dikin û hêviya me berdewmî di kar û xebat û serkevtina wan e.

---

# Dirêjtirîn mirovê cîhanê ne çînî ye, kurdekî Dêrikî ye



Mirovê herî dirêj ne çînî ye, ne somalî ye, kurdek ji Dêrika Çiyayê Mazî ya Mêrdînê ye!

Huseyîn Bisadê ji Somaliyê, 2.36 metro bû ku nave wî ketibû Kitêba Rekoran a Guinnessê. Bao Şişunê Çînî jî, 56 salî ye û 2.36 metro ye ku li çend rojên berê de zewicî.


Xortek ji Dêrika Çiyayê Mazî ya Mêrdînê bi navê **Sultan Kosen** ku 25 salî ye, 6 CM ji her du mirovên dirêj ên cîhanê dirêjtir e. Sultan Kosenê Dêrikî, 2.42 metro ye.

Kosen mideheke berî niha bo emeliyata lingê xwe, tevî endamekî malbata xwe hatibû Stenbolê û bibû remza gelek televizyonên tirk. Sultan Kosen doza jinekê dike lê nabîne!

Ji bo Sultên, pêlav û cil û berg nayên dîtin, lewre jêre bi taybetî têne çêkirin. Hejmara pêlava (sola) Sultên 66 e.

Sultan Kosen niha jî li gundê Dedekoya Dêrika Çiyayê Mazî ya girêdayî Mêrdînê jiyana xwe berdewam dike. Sultan Kosen dixwaze bikeve nava kitêba Rekoran a Guinnessê. **"netkurd"**

# Îtirafkarê PKK'ê 7 Hevalên Xw Di Xew De Kuştin



Îtirafkarê gerîlla yê bi navê **G.E** ku li zîndanê de girtî bû, hêzên ewlekariyê ew ji zîndanê derxistin û tevlî operasyonê kirin.

G. E di şikefteke de 7 gerîlayên ku berê hevalên wî bûn, di xew de girtin û her heft bi klaşînkofê kuştin. G.E yê 24 salî piştî ku hate girtin hemû sirên ku dizanîbûn ji hêzên ewlekariyê re eşkere kirin.

**G.E** bi destûra serdozgerê Diyarbekirê bo 4 rojan ji zîndanê serbest hate berdan û tevlî operasyonê bû.

Yek ji wan girîlayên kuştî Kurdekî Sûriyê bi navê Behzad Zuhab bû.

**"Avesta"**

www.arsivakurdi.org